




Niha çi Bikin?

Afkarî û Şîret li Gel Şîdetê



Niha çi Bikin? – Alîkarî li Gel Şîdetê

Polîsên Kantona Bern bîst û çar saet ji bo ewlehiya we li ser kar in. Em ji bo parastina gel ji sûcan xwedî erk in û tevdigerin ku gel li gorî qanûnan tevbigere.

Bi giştî em dikarin bibêjin ku: Swîsre welatekî ewle ye. Lê li vir jî sûc tên kirin. Hûn li qadên ji her kesî re vekirî de, mînak; cihê wek park û restorant, trêna, otobus û garajên trênan de û qadên xwemalî û heta di gerdûna ferazî de, di internetê de, bi şîdetê re merûz dibînin. Hêzên ewlekariyê ji bo we her dem amade ne û heger hûn merûzê şîdetê bimînin û bibin qurbanî, demildest agahî bidin me. Di dema talûkeyê de telefonên imreyên ewlekariyê yên lezgîn 112 an 117 bikin.

Ji bo Ewlekariya we Polîsê Kantona Bernê şîretan li jêr pêşkêş dike:

Şîdet

Di rewşên neyînî de dûr bisekinin û guhdariya dengê dilê xwe bikin. Tê teswiyekirin ku êvaran û seetên dereng de nêzî mirovên din bisekinin.

- > Ji aliyê kesên din ve neyên provokekirin û hûn jî kesî din provoke nekin.
- > Bi tebitîn, şêwe, mîmîk û bivedenga xwe jixwebaweriya li hemberî kesên din bidin nîşan.
- > Her dem ji kesên biyanî re “Sie” bibêjin û bi van kesan re bi mesafe tevbigerin.
- > Di rewşên hewce de welatîyên nêzê xwe gazî alîkariyê bikin û di van rewşan de hûn jî xwe ji alîkariyê re amade bikin.
- > Di rewşên lezgîn de (nimreyên lezgîn 112 an 117) hêzên ewlekariyê agahdar bikin û hewcetî hebe gelek car bigerin!




Tundijîya Zayendî

Divê devkî, divê binêrîn an jî bi tevger dibe bila bibe, hertim hêmanên sûcê ne. Bi giştî şîdeta cinsî di cihên girtî û cihên xwemalî de (Mînak; li qadên mal û komeleyan de) an jî li cihê kar tê dîtin. Lê di demên dawî de li qadên vekirî de jî, mînak; trêna, otobus, park û li warên din yên mîna café û cihên dansê de jî mirov merûzê şîdeta cinsî tên.

- > Ku hûn bi rewşekî wiha re rûbirû man, bi sekn, şêwe û mîmîkên xwe ve û hewcetî hebe bi tevgerek parastinî ya çalak û neqayîliya xwe re teqez nîşanî li kes hember bidin.
- > Welatîyên li wir û têkiliyên wan ên ku bi bûyerê re tune alîkarî ji wan bixwazin. Alîkariyê mînak; bidengekî bilind qêrîna hawarê û bi peyva “Stopp” dikarin bînin cih.
- > Di rewşên wiha de, cihê hûn li wê ne bi mirovên peywirdar re, mînak; mamoste, komele û rêvebirên saziyan, ajotvanên otobusan bikevin têkiliyê an jî agahdarî bidin hêzên ewlekariyê.
- > Bêdeng nemînin! Bi mirovên misoger û navendên şêwirmendiyê û bi hêzên ewlekariyê (polîse) re vê rewşê bibêjin.

Şîdeta nav malbatê

Şîdet bi çi şêklê dibe bila bibe, ji aliyên civaka me ve teqez nayê qebûl kirin - ev ji bo nav malê û şîdeta ku di nav malbatê de dibe jî derbasdar e! Dûbarekirin, piçûkxistin her wisa qedexebûna jiyana bi derve re, bi zordarî destdanîna ser perên we, sûcdarkirina bêcih, sepandina şîdeta giran, tacîza cinsî û sedembûna tacîza cinsî teqez qedexe û sûc e. Her kesê ku bi van rewşan re merûz dimîne, divê bila zarok be, divê cîran an jî heval be demildest agahdarî bidin ewlekariyê (polîs). Hêzên Ewlekariyê ku van giliyan girt demildest lêpîrsîn dide destpêkirin.



- > Bêdeng nemînin! Giliyên xwe bi saziyên şewirmendiyên berpîrsyar û bi hêzên ewlekariyê re parve bikin.
- > Nimreyên telefonê yê girîng (Polîs 112 an 117 mirovên pêbawer hwd.) hertim li cem xwe bigerînin.
- > Di rewşên lezgîn de mirovên ku hûn alîkarî jê dixwazin pêşî de cespînin - mînak cînarek we.
- > Ewraqên xwe yê girîng û hinek pere li ba kesekî hûn jê bawer dikin bi sergirtî veşêrin.

Ji bo kesên derveyî bûyerê:

- > Di rewşên lezgîn de: pêşî têkilî, paşê bi ewlehiya xwe bînin cî - bi lezûbez agahî bidin hêzên ewlekariyê xwe neavêjin talûkeyê!
- > Di rewşa şikkirina şîdeta di nav malbatî de:
 - Ku we şikbir, mirovên têkildar agahdar bikin.
 - Ji bo mirovên têkildar re xwe amade bikin û alîkariya xwe nîşanê wan bidin.
 - Ji mirovên têkildar re der heqê alîkariya saziyên şewirmend de agahî bidin.
 - Mirovên ku bi şîdetê re merûz mane re, dema ku herin polîs xwe li cem wan amade bikin.
- > Mirovên li derveyî bûyerê dikarin ji saziyên şewirmend alîkarî û agahî bistînin.

Hêzên polîsean têkildar, mirovê ku şîdet pêk aniye ji cihê bûyerê dikare dûr bixe û jê re cezayê 14 rojên din ji cihê bûyerê dûr bikeve bide sepandin. Heger metirsiyeke mezin ji bo jin û zarokan li wê derê hebe, dikare li spartgeha jinan veşartî xwe biparêze.

Mirovên bi yekbûna malbatê ve dizewicin û li vir dijîn, ku ji hemserê xwe rastî şîdetê bînin, hemserê xwe dikarin berdin û ji bo destûra rûniştgeha xwe serî lê bidin û ji vî mafê sûd bigirin. Di van rewşan de raporên xwe yê ji doktor û nexweşxaneyê ku bi şîdetê re merûz mane û raporên ku ji ewletiyê û saziyên têkildar ve hildane hewceye diyar bikin.

Zewaca Zordarî û Bihevra û Bêmedî

Li Swîsrê bi xwesteka xwe zewac û vebijêrkiya hemserê xwe ve serbest e, her kes bi kî/kê re bixwaze dikare bizewice. Di bin zext û darê zorê zewac qedexe ye. Zewacên di van şertan betal in. Mirovên dizewicin berdwamkirina zewacê de serbest in û vebijêrkaberdawamî û hevûdûberdanê de serbixwe ne.

- > Hûn hevalên xwe li derdora xwe de bi van rewşan re merûz bimînin, mirovên nêzê we yê hûn pêbawer in û saziyên têkildar yan jî polîs agahdar bikin.

Nerihet

Eger mirovek kesekî din li dijî daxwazî wî bê navber bixe têkiliyê, aciz bike, bişopîne yan jî diyariyan jê re amade bike, ew kês pê aciz bibe. Ji vê nerihetkirinê gotin. Kirinên-nerihet wisa ne bo mînak terora telefonê, smsên tehdîtê, mailên rojane, serdana cihê kar, diyariyên bi rêkûpêk, serdana bê pirs ya malê, şopandina veşartî ya giştî û taqîbat. Kirinên-nerihet yê yekser dibin sûc bin û kesê rastî nerihetkirinê hatiye dikare li gorî qanûnên sîvîl xwe ji têkiliyên bi vî rengî biparêze.

- > Tu bi awayekî teqez û diyar rave bike ku tu naxwazî têkilî berdewam bike.
- > Paşê tu bersiv nedin telefon, Email hwd. û tu diyarî qebûl nekin. Dibe ku ev zehmet be: lê hûn aşkera bi biryar tevbigerin.
- > Agahdarî bidin derdora xwe: Malbat, dost, heval û cîranên xwe. Ev kes dikarin piştgirî bidin te.
- > Hemû kiryarên ji aliyê kesê dijber hatiye bi roj, dem, cî û belgeyan li ba xwe binivîsin.
- > Li şêwirdariyê bigerin! Navendên şêwirmendiyê û polîs ji bo we li ser kar in.

Qurbanîbûna Sûcekî

- > Rewşên bi guman û demên talûkê de telefonî 112 an jî 117 bike û alîkarî bixwaze.
- > Li cihê bûyerê ti guhertin çênekin.
 - Şopên heyî tune nekin.
 - Cihê bûyerê serheve nedin û cihê bûyerê paqij nekin.
 - Cilên ku di dema bûyerê de li ser te bûn neşûn.
- > Birîndarên laşî yê ji dema bûyerê di demeke zû de (herî dereng di nav 72 saetan de) ji aliyê doktorê yan jî doktora malbatê yan jî ji aliyê saziya tendûristiyê ve bidin qeydkirin.

Bi saziya şewirê yan jî bi polîs re bikevin têkiliyê:

- > Ji bo alîkarîxwestinê teredût nekin!
- > Saziya şewirê piranî bê pere alîkariya we dike
- > Tu dikarî serî li saziyê şewirê bidî, bêyî ku tu polîs agahdar bikî.
- > Saziyên şewirê nikarin bêyî ku destûr ji te bistînin polîs agahdar bikin.
- > Mirovên mexdûr yê ku destûra îqameyê wan nediyar jî dikarin ji şewirmendiyê sûd bigrin.

Ji bo di derheqê sûcekî de agahî bidî Polîs (ixbara sûcekî/gilîkirina kesekî) tu dikarî di nav sînorê Swîsreyê de bi riya telefonê yan jî bi serê xwe serî li her navenda polîs bidî. Em di derheqê bûyerê de pirsan ji te dikin û çî tiştê tu bibêjî em li ba xwe dinivîsin. Di derheqê rewşek şideta zayendî de be lêpirsîna te karmandek hemcinsê te dike. Gava zehmetî ji ber nezanîna zimên de derkeve em wergêrek tercûman organîze dikin.

Şopandina Cezayê

Li Polîs bangewaziya sûcê şûnde, ji aliyê me ve dderheqê bersûc de şopandina cezayê tê destpêkirin. Em li delîlên pêwîst digerin, şopan tomar dikin, te, - û kesên tekildarê sûcê dixin lêpirsînê û / sûcdar jî. Em di bûyerên giran de berî ku kesê têkildar her wisa gava kesê din me agahdar bike, em dest bi şopanîne dikin. Paşê dozgerî yan jî dadgeh biryara di derbarê sûcê dide.



Hûn li vê derê alîkarî û şêwirî digirin

Rewşên lezgîn û alîkariya teqez (hejmarên telefonê yê bê pere, 24 saet)

Polîs	112 yan jî 117
Ambûlans/Hawarî	144
Telefona têkiliyê polîs ji bo jinan (Telesekreter; polîsa jin paşê telefon dike)	031 332 77 77
Die Dargebotene Hand (Destê alîkariyê dirêjkirî) – alîkariya anonum û şêwirî ji bo mezinan	143
Pro Juventute (piştgirên Juventute) – alîkariya anonum ji bo zarok û ciwanan.	147

Şêwiriya Mexdûran

Saziya şêwirê – Opferhilfe Bern (alîkariya mexdûran Bern)	031 370 30 70
Saziya şêwirê – Opferhilfe Biel (alîkariya mexdûran Biel)	032 322 56 33
Lantana – saziya beşî alîkariya mexdûran ya şîdeta zayendî li dijî keç û jinan, Bern	031 313 14 00
Vista – saziya beşî alîkariya mexdûran ya şîdeta zayendî û navmalbatî, Thun	033 225 05 60
Fachstelle Häusliche Gewalt Stadt Bern – (saziya beşî şîdeta navmalbatî ya bajarê Bernê)	031 321 63 02
Frauenhaus Bern – (Spartgeha jinan Bern)	031 332 55 33
Frauenhaus Region Biel – (Spartgeha jinan herêma Biel)	032 322 03 44
Frauenhaus Thun – Berner Oberland - Spartgeha jinan Thun-deşta Bernê	033 221 47 47
saziya beşî şêwira-nerihetkirinê – Bern	031 321 68 97
Zwangsheirat.ch – Zewacên bi destê zorê	021 540 00 00

Şîreten giştî

frabina – saziya şêwirê ji bo têkiliya jin û mêrên du-hemwelatî	031 381 27 01
ISA – saziya agahî û şîretê ji bo biyaniyan û arîşeyên biyaniyan	031 310 12 72

Filmên agahdarkirinê di derbarê hevjiyanê de tu dikarî bi vî zimanî
û zimanên din li ser malperê bibînî: www.police.be.ch



App'a me ji xwe re daxê:
www.police.be.ch/app



Tu me li ser Twitterê bişopîne:
www.police.be.ch/twitter